P.Y.D.K.S û vekirina navendan

li ber roniya biryara komîta rêvebir di dermafê vekirina navendan de, di siya heyama şoreşa Sûrirê de , û bi taybetî piştî damezrandina Desteya Kurd a Bilind, partiya me dest bi vekirina navendên xwe dike , û bi vê gavê derbasî qonaxeke nû ji xebata aşkere dibe:

Roja pêncşemê 2-8-2012 li bajarê Efrînê , roja yekşemê 12-8-2012 li bajarê Helebê (taxa Eşrefiyê) , roja Înê 24-8-2012 an li bajaroka Badîna, roja Înê 31-8-2012 an li bajarê Reco , roja sêşemê 11-9-2012 an li bajarê şiyê , roja Çarşemê li bajaroka Meydankê 3-10-2012an, û li roja Înê 5-10-2012 li bajarê Cindirêsê, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, bi rêweresmên şaristanî û bi beşdariya bi hezaran ji gelê me yê Kurd , heval û dost , Kesayetiyên serbixwe , çi Kurd çi Ereb , nûnerên partiyên me yê Kurd , komele û saziyên sêvîl, û bi taybetî nûnerên herdu Encûmenên me yên Kurd navendên xwe vekirin. Belkîm di rojên werin de , navendin din jî werin vekirin .

Di vekirina hemî navendan de , gotina partiya me , gotina Encûmena nîştimanî ya Kurd , gotina Encûmena Gel a Rojavayî Kurdistanê ji bilî Reco-, gotina rêxistina me li wê deverê-ji bilî ya Helebê-, Herweha gotina komela Rewşen Bedirxan a jinên Kurd , gotina rêxistina parêzeran a partiya me li Helebê , saziya zimanê kurdî û hin gotin û helbestên ji vir û wir li hin ciyan pêşkêş bûn. □ bi awakî serkeftî , rêweresmên vekirina wan navendan bi dawî bûn.